



ZAROKÊ MIN BI AWAYÊ PIRRZIMANÎ MEZIN DIBE

Rêbera taybetî dêûbavan derbarê pirrzimaniyê

Bi van zimanan jî liberdest e:

Albanyayî

Erebî

Bulgarî

Inglîzî

Farisî

Fransî

Almanî

Polonyayî

Rûmanyayî

Rûsî

Tirkî

naverok

Pêşek	5
Çawa zimanê zarokê min bi pêş dikeve?	6
Ez çawa dikarim ji bo pêşketina zimanê zarokê xwe piştgir bim?	7
Hin şîret ji bo xurtkirina zimanê gelemperî	8
Gelo bi pêşketina zimanê zarokê min, her tişt dê biserûber bibe?	9
Kî duzimanî/pirrzimanî ye?	10
Çawa zarokê min ziman hîn dibe?	11
Dibe ku çi biqewime?	12
Baldarî! Aloziya zimanî	12
Devberdan ji axaftinê	12
Destpêkirina bi derengî ya axaftinê	12
Zimanek dê bihêztir bibe! – Zimanê serdest	12
Di dema hînbûna çend zimanan da çi tiştêk girîng e?	13
Ez çawa dikarim ji bo pirrzimaniya zarokê xwe piştgir bim?	14
Komên dêbav-zarokan ên pirrzimanî	15
Çavkanî	15

Dêbavên hêja,



© Gebhard Bückler für den Kreis Viersen

Gelek zarok li civaka me di jiyana xwe ya rojane da bi çend zimanan diaxivin û di atmosfereke pirrzimanî da mezin dibin. Ev ji bo we wek dêbav renge bihê vê wateyê ku di perwerdehiya we da rola çend zimanan heye.

Dê û bav di rewşeke wiha da pirranî vê pirsê ji xwe dipirsin ku pêşketina ziman a asayî di rewşa pirrzimaniyê da bi çi awayî ye û ew çawa dikarin bi baştirîn awayî piştta zarokên xwe bigirin.

Ev rêdar dixwaze piştta we di mijarên têkildarî mijara perwerdekirina pirrzimanî bigire. Ev rêdar zanista zemîneyî ya ku bi hêsanî tê famkirin dabîn dike û şîretên sûdmend û giştalî ji bo xurtkirina ziman di rewşa pirrzimaniyê da raber dike ku bi hêsanî di jiyana rojane ya malbatê da dikare were bicihkirin.

Hêviya me ev e ku ev rêdar ji bo sûdmend û bimifa be.

Rêveberê navçeyê

A handwritten signature in black ink, appearing to read 'Andreas Coenen'.

Dr. Andreas Coenen

Çawa zimanê zarokê min bi pêş dikeve?

Pêşketina ziman di zarokan da
Şirovekirina xwerû
0-5 sal

3-5 sal

- Temenê pîrsa duyem: Pîrs li ser çimayiyê
- Hevrok hevrê di gel hevokên ne-sereke

2-3 sal

- Nijyar û pêşketina rêzimanê
- Hevokên xwerû, kişandina peyvan

18 meh – 2 sal

- Hevokên du û pîrr peyvî
- Temenê pîrsa yekem

1 sal – 18 meh

- Hevokên yek-peyvî
- Navê kes û tiştan
- Dubarekirina kîteyê û bizarkirina ddeng

6 Meh – 1 Sal

- Axaftin di gel xwe bi deng û peyvên nediyar
- Bizarkirina xwe û kesên din

Jidayîkbûn heta derdora 1 saletiyê

- Qirîn di dema jidayîkbûnê da



Ez çawa dikarim ji bo pêşketina zimanê zarokê xwe piştgir bim?

- Tu baştirîn mînaka zimanê ji bo zarokên xwe yî. Eva ku ew çawa biaxivin, çi bibêjin û kengî biaxivin – zarok tevahiya van mijaran di Malzarokê da tê digihêjin da ku piştra bi zarê wan bikin û bi xwe wan biceribînin û test bikin.



Wêne 1: Bi palpiştiya rêxistina alîkarîgihan a Sprachpyramide



© JackF - stock.adobe.com

Dê û bav ji bo zarokên xwe mînakeke zimanî ne!

Hin şîret ji bo xurtkirina zimanê gelemperî

- Di gel zarokê xwe heta radeya pêkan bi zimanekî ku tu bi xwe hest dikî rihettir ji zimanên din e, gelekî biaxive.
- Zarokê xwe teşwîq bike, da ku gelek tiştan bo te bibêje û **derfeteke zehf bide wî/wê da ku bi xwe biaxive**. Bihêle bila heta dawiyê biaxive û axaftina wî/wê nebirre. Temaşekirina li televîzyon an vîdyoyan nikare dewsgîrek ji bo vê danûstandina zimanî be. **Jiyana rojane** gelek derfetan ji bo danîna têkiliyê di gel zarokê te û beşdarkirina wî/wê **di gotûbêjan da** dabîn dike.
- **bi zarokê xwe ra bi hevokên kurt û xwerû, bi zimanê devkî (ne "Zimanê Zarokan")! û ne gelekî bilez biaxive**. Bi awayekî hedefmend hin peyvên ku zarok hîn wan nas nake dubare bike.
- **Dema ku zarokê te şaşitiyên axaftinê dike, pê nekene**, heta eger gelekî pêkenî be. Şaşitiyan serrast neke, dewsa wê, tiştê ku hatiye gotin bi awayê durust dubare bike.
- **Guhdariya zarokê xwe bike û pesna wî/wê bide!**
- **Hevrê di gel zarokê xwe pirtûkekê bixwîne** an bi hev ra biçin pirtûkxaneyê û rê bide bila ew pirtûkên ku bala wî/wê dikişînin, hilbijêre.



Wêne 2: Bingehên xurtkirina ziman

Gelo bi pêşketina zimanê zarokê min hemî tişt biserûber dibe?

Zarokên ku bi awayê pirr zimanî mezin dibin jî renga weke zarokên yekzimanî, hin kêşeyên wan têkildarî pêşketina ziman hebe. Pirsgirêkine wiha qet ji ber atmosfereke pirr zimanî pêk nayên. Eger tişteki encameke baş tunebû, ev yek pirranî bi hokarên din wek mînak kêşeya Bihîstinê an pirsgirêkên derûnnasiya yê ehebî (neuropsychologischen) ra têkildar e.

Tu dikarî pirsgirêkên gengaz wek mînak ji ber wê yekê tê derxîni ku zarokê te:

- Di salvegera yekem a jidayîkbûna xwe da wer xuya dike ku çend peyvan tê nagihêje, bi rêya amajeyê bala nakişîne ser tişteki an bertek nîşanî navê xwe nade;
- di sala duyem a jiyana xwe da ji bo axaftinê hewil nade an tenê hejmareke hindik a peyvan tê digihêje;
- di sala sisyana a jiyane da tenê carinan hevokên bi du peyvan çêdike an bi dijarî peyvên nû hîn dibe.

Gelo tu hest dikî ku zarokê te di pêşketina ziman da kêşeya xwe heye? Gelo tu hest dikî ku ew hejmareke hindik a peyvan dizane, pirsgirêkên wî di warê bilêvkinê da hene û nikare bi awayekî guncan di gel derdorên xwe bikeve têkiliyê?

Di ofîseke bijîşkê zarokan an navenda Şewirîna Malbatê şewirîne werbigire.



©Robert Kneschke - stock.adobe.com

Kî duzimanî/pirzimanî ye?

- Zarokek di rewşekê da pirzimanî ye, ku di jiyana rojane da bikare bi zêdetir ji zimanekî bi awayekî çalak têkiliyê çêbike.
- Meiznbûna bi zêde ji zimanekî derfeteke mezin ji bo zarokê te dabîn dike.
- Mejiyê zarok dikare bêyî ku bikeve bin zexteke gelekî zêde, çend zimanan bi awayê hevdem hîn bibe. Zarokek her çiqasî zûtir tûşî zimanekî were, hînbûna vî zimanî heta ji bo wî/wê hêsantir e.


Her zarokek zimanekî bi awayê kesane hîn dibe.

Hin zarokan hewceî bi demeke zêdetir hene.


Derfet bide zarokê xwe û bi sebr û hedar be!

Zarokê min çawa çend zimanan hîn dibe?

- Bi awayê hevdem – Hînbûna ziman a hevdem – di rewşekê da ku zarokek ji dema jidayîkbûnê va du an çend zimanan hîn bibe.



- Bi awayê lipeyhev – Hînbûna ziman a Hêdî hêdî di rewşekê da ku zarokek *wek mînak piştî sala sisiyan a jîyanê, zimanekî duyem an sêyem hîn dibe*. Yanî zimanê duyem an sêyem piştî zimanê yekem tê hêvosîn.





©Robert Kneschke - stock.adobe.com

Dibe ku çî biqewime?

Baldarî! Aloziya zimanî

- Zarok zimanên xwe tev li hev dikin û wan bi şaşî dewsa hev dadihînin. Ev ne-normal nîne ku zarokên ku zimanekî nû hîn dibin, di destpêkê da hin şaşitiyên taybet pêk tînin. Pirranya van şaşitiyan vê yekê nîşan didin ku zarok di rêya durist a hînbûna zimanê almanî da ne.

Devberdan ji axaftinê

- Hin malbat radigihînin ku qonaxin hene ku di wan da zarok tenê bi zimanê almanî diaxivin û naxwazin ku bi zimanê malbatê biaxivin. Tu hegerek ji bo nîgeraniyê tuneye.
- Bi awayekî mentiqî hema wisa bi zimanê xwe di gel zarokê xwe biaxive. Zarokê te heta wek Guhdar (Bîser) dikare zimanê te zêdetir berfireh bike û teqez ew ê dîsan bi wî zimanî biaxive.

Destpêkirina dereng a axaftinê

- Di rewşa pirrzimaniyê da, destpêkirina axaftinê di 14 heta 16 mehiyê da asayî ye.

Zimanek dê bihêztir bibe! – Zimanê Serdest

- Eger ziman wekî hev bin û bi qasekê bihên bikaranîn, ew ziman dê bi awayê hevdem bi pêş bikevin.
- Di rewşekê da ku ziman gelekî ciyawaz di gel hevûdu bin, di wê rewşê da ziman bi awayekî ciyawaz bi pêş dikevin: Zimanê Bihêz û Zimanê Lawaz.



Di dema hînbûna çend zimanan da çi tiştêk girîng e?

Têkiliya zehf di gel zimanan!

- Heta radeya pêkan Zûdem .
- Heta radeya pêkan **pirraniya deman**.

Raberkirina gelek pêşniyazan!

- Pêkanîna derfetên zimanî di jiyana rojane da.
- Organîzekirina hin serdanan ji welatê jêderk an derveyî welêt.
- Cejnên organîzekirî li dar bixin û bi kesên ku bi wan zimanan wek zimanê yekem diaxivin, hevdiîtin pêk bînin.
- Beşdariya di komên lîstinê an cejnên zarokan ku di wan da zarok li nav koma xwe bi zimanekî diaxivin.



©Robert Kneschke – stock.adobe.com

Ez çawa dikarim ji bo pirrzimaniya zarokê xwe piştgir bim?

- **Bi zimanê xwe yê Zikmakî (Zimanê Dayîkê) di gel zarokê xwe biaxive.** Wek dayîk an bav hertim bi zimanekî bi zarokê xwe ra biaxive ku bi baştirin awayî dikarî bi wî zimanî wî/wê aram bikî, li ber dilê wî/wê biçî û meyl û heza xwe nîşanî wî/wê bidî.
- **Di rewşa duzimanîbûnê da li nav malbatê „Rêzikên Zimanî“ diyar bike û bisepîne.** Bi serê xwe zimanan li malbatê neguherîne û wan bi kar neyîne: Ji bo zarokê te ev yek girîng e ku bikare zimanekî taybet di gel rewşên taybet an jî di gel kesekî taybet têkildar bike, wek mînak zimanê tirkî di gel dayîkê û zimanê almanî di gel bavo.
- **Berdewam û zû bi zû vê derfetê bide zarokê xwe ku zimanê duyem biceribîne û wê bi kar bîne.** Di rewşa jiyana rojane da zimanê duyem rihettir di cihê lîstinê, di gel hevalan, li malê an jî li Zarokxaneyên tê hînirin.
- **Hebûn û beşdariya birêkûpêk li Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan (Kita) ji bo hînbûna zimanê almanî alîkar e!** Di rewşekê da ku zarokê te di dema çûyîna bo Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan (Kita) hîn bi zimanê almanî naaxive da, hema wisa di gel wî bi zimanê xwe yê Zikmakî biaxive. Bi vî awayî tu piştta zarokê xwe di kemilandina ziman bi zimanê wî/wê yekem digirî. Hevdem têra xwe derfet bide zarokê xwe ku li derveyî Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan (Kita) di gel zarokên almanî bilîze da ku bikare bi başî zimanê almanî hîn bibe.
- **Ji bo zarokê xwe pirrî wextan bi du zimanan bi deng bixwîne!** Ji bo xwe pirtûkên bi zimanên têkildar bikirre.
- **Nêrîneke erênî derbarê Pirrzimaniyê bide zarokê xwe:** Ew karekî dizane ku yên din wî nizanin, ew pêka wan xwedanê serpişkî û puenekê ye.
- **Li pêşniyaz û derfetên heyî li hawîrdorê bigere!** Her çiqasî têkiliya zarokê te di gel zimanekî zêdetir be, bi heman rêjeyî ew ê wî zimanî baştir hîn bibe.
- **Medyayên elektronîkî yên baş weke Televîzyon, DVD, CD, radiyo, Tablet û Jîrefon (Smart Phone) û di encamê da Înternetê hîlbijêre.** Di vî warî da heyama bikaranîne gelekî girîng e.

Komên dêbav-zarok ên Pirrzimanî



Griffbereit

- Bernameya fêrkirina malbatê ya taybetî dêbav û zarokên wan ên ji 0 heta 3 salî.
- Xurtkirina Pirrzimaniyê bi rêya çalakîyên guncan ji bo zarok.



Rucksack KiTa

- Bernameya fêrkirina malbatê ya taybetî dêbav û zarokên wan ên ji 4 heta 6 salî ku diçin Navendeke Miqatebûna rojane ji Zarokan (Kita).
- Xurtkirina hevdem a zimanê malbatê û zimanê hawîrdorê.

Ji bo wergirtina agahiyên zêdetir, di gel Kommunalen Integrationszentrum des Kreises (Navenda Entegrasyonê li civaka xwecihî ya Navçeya Viersen'ê) bi hejmara telefona 02162 39-1961 bikeve têkiliyê an jî Email'ekê bişîne adresa felicia.bot-jurca@kreis-viersen.de.

Çavkanî

Di dewamê da tu yê hin çavkaniyan bibînî ku di vê rêdarê da lêveger bo wan hatiye dayîn.

- Abdelilah-Bauer, B. (2012). Zweisprachig aufwachsen: Herausforderungen und Chance für Kinder, Eltern und Erzieher (3. Auflage 2016). München: Verlag C.H. Beck
- Burkhardt Montanari, E. (2000). Wie Kinder mehrsprachig aufwachsen: Ein Ratgeber. (7. Auflage 2020). Frankfurt am Main: Brandes & Apsel Verlag
- Chilla, S. und Fox-Boyer, A. (2012). Zweisprachigkeit/Bilingualität: Ein Ratgeber für Eltern. (2. Auflage 2016). Idstein: Schultz-Kirchner Verlag
- Goethe-Institut, Sprachabteilung. Kinder entdecken Deutsch: Eine Broschüre für Eltern und Pädagogen. Warschau
- Haid, A. (2012). Kindlicher Spracherwerb: Kinder lernen sprechen, Informationsbroschüre. (2. Auflage 2012).
- Hilfswerk, Österreich. (2020). Sprechen macht schlauer: Wie Kinder fürs Leben lernen. Mattersburg: Wograndl
- Hricova, M. (2021). Sprachförderung bei Mehrsprachigkeit: Ein Ratgeber für Eltern, Pädagogen und Therapeuten. Idstein: Schultz-Kirchner Verlag
- Jimenez, M.I. (2015). Mit Sprache umhüllen: Praktische Tipps für die bilinguale Erziehung. Pulheim: Schau Hör Verlag
- Land Niederösterreich, Amt der NÖ Landesregierung. (2020). Sprich mit mir und hör mir zu!: Eine Broschüre für Eltern, 12 Anregungen wie wir unsere Kinder beim Sprachenlernen unterstützen können 0 – 6 Jahren. St Pölten: Amtsdruckerei
- Leist-Villis, A. (2008). Elternratgeber Zweisprachigkeit: Informationen & Tipps zur zweisprachigen Entwicklung und Erziehung von Kindern. (7. Auflage 2016). Tübingen: Stauffenburg Verlag
- Nodari, C. und De Rosa, R. (2003). Mehrsprachige Kinder: Ein Ratgeber für Eltern und andere Bezugspersonen. (2. Auflage 2006). Bern: Haupt Verlag
- okay. zusammen leben, Projektstelle für Zuwanderung und Integration. (2010). Sprich mit mir und hör mir zu! 12 Anregungen wie wir unsere Kinder beim Sprechenlernen unterstützen können: Eine Broschüre für Eltern. Dornbirn: VVA, Vorarlberger Verlagsanstalt
- Triarchi-Herrmann, V. (2011). Mehrsprachige Erziehung: Wie Sie Ihr Kind fördern. (3. Auflage 2012). München: Ernst Reinhardt Verlag
- Universitätsstadt Tübingen, Gleichstellung und Integration. (2012). Mehrsprachig aufwachsen: Ein Gewinn für Bildung, Informationen für Eltern und Lehrkräfte. Interne Dienste

Navçeya Viersen'ê

Rêveberiya karên civakî – Navenda Entegrasiyona li Civaka Xwecihi
Rathausmarkt 3 | 41747 Viersen
www.kreis-viersen.de

Piştewana aborî:

Ministerium für Kinder, Familie,
Flüchtlinge und Integration
des Landes Nordrhein-Westfalen



Ministerium für
Schule und Bildung
des Landes Nordrhein-Westfalen



Hûngiliyên Weşangerê

Weşanger: Qayîm Meqamtiya navçeya Viersen'ê
Serrastkirin: Kommunales Integrationszentrum
(Navenda Entegrasiyona li civaka xwecihi)
Beşa serrastkirinê: Ofîsa çapemeniyê
Dîzayn: Ofîsa çapemeniyê
Çap: Navenda Çapê ya Navçeya Viersen'ê
Weşandin: Çîleya 2022an
Wêne: ©Navçeya Viersen'ê – Di rewşekê da ku
tiştêkî din nehatibe hilêxistin
Grafîkên Ragihandinê: ©Navçeya Viersen'ê – Navenda
Entegrasiyona li civaka xwecihi

